Ronahî
Şopdara Rastiyê ye
Rojnameya siyasî, civakî û çandî Jimar :1194 11-Tebax-2024 www.ronahi.net/ku/

Navnîşan
www.ronahi.net/ku/
rojnameyaronahi
@ronahikurdi55
nameronahi@gmail.com
Rojnameya Ronahî
+963 984 370 218

# Seferberiya Têkoşîna Dîrokî

**Heval Dilbıhar**

Avabûna komara dewleta tirk li ser bingeha nîjadperestiyê/tirkperestiyê ku tunehesibandin, pişaftin û jiholêrakirina hemû netewe, gel, kom û derdorên din ferz dike pêk hatiye. Ji bilî tirkbûyînê tu kom, gel, netewe, bawerî û çandên din nas nake. Ji ber vê jî ji destpêkê heta niha hewl dide ku kom, gel, netewe, bawerî û çandên ne ji xwe bibişivîne û ji holê rake. Ev rastiya dewleta tirk îro jî bi teşe, şêwaz, rê û rêbazên nûjenkirî û rojanekirî berdewam dike.

Bi vê rastiyê ve têkildar dewleta tirk sed sal in li dijî neteweya kurd û hemû nirxên wê -qirkirin û komkujiya fizîkî jî tê de- her cureyê hovîtiyê dimeşîne. Bi taybetî jî qirkirin û komkujiya çandî di asta herî jor de pêk tîne. Hewl dide ku hebûna kurdan a xwebûnî û hemû nirxên wan ên dîrokî, neteweyî, civakî, çandî û hwd. di nava pencên qirkirina çandî de bihelîne û ji holê rake. Bêguman ev yek ji komkujiya fizîkî xetertir e.

Tevgera Azadiya Kurdistanê ya Xwebûnî û Gerdûnî bi dehan sal e bi armanca pêşîlêgirtina her cureyê hovîtiyên kurdkujer û ji bo pêkanîna rizgarî û azadiya gelê kurd û hemû gelên din, li dijî her cureyê tevkujiyê têkoşîneke bêhempa dimeşîne. Di encama vê têkoşînê de daxwaza dewleta tirk a tunehesibandin, pişaftin, helandin û jiholêrakirina neteweya kurd di qiriqa wê de maye û gelê kurd hebûn û xwebûna xwe bi hemû cîhanê daye hesandin û xistiye rojeva hemû cîhanê. Lê ji ber ku dewleta tirk bi rengekî erênî ji binî ve xwe neguhert, civaka xwe li ser bingeha civakbûyîneke demokratîk ji nû ve ava nekir û berevajiyê wê, rewşe hovîtiya xwe li gor rewş û şert û mercan nûjen û rojane kir hê jî heta dawiyê û ji her milî ve hewl dide ku neteweya kurd bibişivîne, bihelîne û ji holê rake.

Ji destpêkê heta niha riya sereke ya pêkanîna vê yekê di bêbandorkirina RêberEvdilah Ocalan û Tevgera Azadiyê de dibîne. Lewra ew jî baş dizane ku Rêber Ocalan û Tevgera Azadiyê nirxên bingehîn ên felsefîk ramanî, bîrdozî, polîtîk, manewî, moral, motîvasyon, konsantrasyona gelê kurd û têkoşîna wî ya rizgarî û azadiyê ne. Baş dizane ku heta Rêber Ocalan û Tevgera Azadiyê bêbandor neke dê nikaribe zimankujî, çandkujî, nasnamekujî, bîrkujî, jînkujî, axkujî, avkujî, civakkkujî, warkujî, welatkujî, xwezakujî û kuştin û qirqirinên din ên li ser nirxên neteweya kurd û Kurdistanê pêk bîne. Ji ber vê yekê tecrîda li ser Rêber Ocalan û êrişên li ser Tevgera Azadiyê di heman demê de rasterast tecrîda li ser ziman, çand, wêje, huner, nasname, civak, welat û hemû nirxên bingehîn ên neteweya kurd e; ku armamca bingehîn a tecrîda ku em jê behs dikin dorpêçkirin, dortengkirin, pişaftin û di nava demê de helandin û jiholêrakirina hemû nirxên neteweya kurd û hêz û têkoşîna wan e.

Gelek diyar e ku di vê serdema ku şerê sêyemîn ê cîhanê herî zêde xwe li Rojhilata Navîn dide der û hêzên emperyalîst û kapîtalîst, herwiha hêzên dagirker dixwazin ku gelek cih û welatan li gor daxwazên xwe ji nû ve saz bikin de hemû êrişên li ser neteweya kurd, nirx û hêzên wê yên bingehîn ên li ser hemû qadên gelê kurd ji têkildarî hev in û ji navendekê tên bi rêvebirin. Ev dagirtin û êrişên dawiyê yên leşkerî yên li başûrê Kurdistanê, dîsa tecrîda girankirî ya li ser Rêber Ocalan û dîlgirtiyên azadiyê, êrişên li ser jin, ciwan, xweza, ziman, çand û nirxên din ên neteweya kurd ên li bakurê Kurdistanê û êrişên li milên din ên Kurdistanê jî parçeyek ji konsepta êrişên tevahî ne.

Bêguman gelê kurd ê li her çar milên Kurdistanê, Ewropayê û li her derê cîhanê, hemû hêzên rizgarîxwaz û azadîparêz ên gelê kurd û hemû derdorên şoreşger, demokrat û xwedî bext jî li dijî van êrişan têkoşîna xwe dimeşînin. Helbet dema ku em ast û radeya êrişên desthilatdariya hovane û rastiya Tevgera Azadiya Kurdistanê bînin ber çavên xwe em ê bibînin ku asta têkoşînê têrê nake; divê têkoşîna polîtîk, entelektuelî û civakî ya li dijî wan êrişan di asta seferberiyê de li her qadê û ji her milî ve gelek û gelek berfirehtir, zêdetir û wêdetir be; têkoşerî, şoreşgerî, afirînerî, encamgirî û serketin di asta gelek pêşdetir be. Bi taybetî divê rewşenbîr, nivîskar, hunermend û hemû derdorên entelektuel û azadîxwaz li dijî her cureyê êrişên dagirker û mêtînger ji her demê zêdetir hem bi gotinên xwe hem jî bi sekn, helwest û kiryarên xwe bi rengekî şênber wek zana û pêşengên gel li her qadê têkoşîna xwe bilindtir û firehtir bikin, bi hiş û giyanê yekrêziya neteweya kurd a xwebûnî, azad û demokratîk hewl bidin ku hemû hêz û derdorên kurd bînin gel hev, li dijî hemû hêz û derdorên ku li gor yekrêziya neteweyî tevnagerin, berevajî bi neyarên kurdan re di nava hevkariyeke qirêj de ne û li gel wan li dijî hêzên rizgarîxwaz ên neteweya xwe bi rengekî bêbext û bêrûmet tevdigerin bi awayekî rasterast di asta herî bilind de xwedî helwesteke zelal a şoreşger de bin, peywir û berpirsyariya xwe ya rewşenbîrî û entelektuelî bînin cih.

Divê em yek kêliyê ji bîr nekin ku heyama em tê de ne ji her demê zêdetir dîrokî ye; çi bibe bila bibe divê em hemû kurd jî li gor wê bi bîr, hiş û giyanê seferberiyeke dîrokî tevbigerin û serketin û serfiraziya ku me di şerê yekemîn û duyemîn ê cîhanê bi dest nexistî di şerê sêyemîn ê cîhanê de bi dest bixin; li ser bingeha felsefe, xet, bîrdozî û ramanpergala xwebûnî û gerdûnî xwe ji her milî ve ava û saz bikin, bibin xwedî statuyeke neteweyî û navneteweyî.





Sudoku: Bersiv 99

| | | | | | | | | |
|---|---|---|---|---|---|---|---|---|
| 7 | 9 | 3 | 8 | 1 | 4 | 6 | 2 | 5 |
| 8 | 6 | 4 | 5 | 2 | 3 | 7 | 9 | 1 |
| 1 | 2 | 5 | 7 | 6 | 9 | 4 | 3 | 8 |
| 4 | 8 | 6 | 3 | 9 | 1 | 5 | 7 | 2 |
| 3 | 5 | 7 | 2 | 8 | 6 | 1 | 4 | 9 |
| 2 | 1 | 9 | 4 | 7 | 5 | 3 | 8 | 6 |
| 6 | 3 | 1 | 9 | 4 | 8 | 2 | 5 | 7 |
| 9 | 4 | 2 | 6 | 5 | 7 | 8 | 1 | 3 |
| 5 | 7 | 8 | 1 | 3 | 2 | 9 | 6 | 4 |

Sudoku:Pirs 1

| | | | | | | | | |
|---|---|---|---|---|---|---|---|---|
| | 5 | 4 | | | | | 1 | |
| | | | 9 | | | 7 | 6 | |
| 6 | 1 | | 2 | | | 9 | | 4 |
| | | | | 2 | | | | 6 |
| 3 | | | 8 | 1 | 6 | | | 5 |
| 7 | | | | 4 | | | | |
| 4 | | 1 | | | 3 | | 2 | 9 |
| | 8 | 6 | | | 4 | | | |
| | 9 | | | | 2 | 1 | | |

## FERHENGA BIWÊJAN

**Pozê xwe lê kir:**
- Pê re neaxivî; bê xwesteka xwe pê re axivî; rûyê xwe lê tirş kir; qîmet nedayê.
**Rû nedayê:**
- Qîmet nedayê.
**Tifinga destê te, ma teşiya diya te ye:**
- Dema yek guh nade tiştên biqîmet hingê tê gotin.
**Ti kes nayne qama xwe:**
- Ti kes qîmet nadiyê; haya ti kesî jê nîne; ti kes guhê xwe nadiyê.
**Ti kes pîvazan pê hûr nake:**
- Ti kes qîmet nadiyê.
**Av negihat serê:**
- Pir bilez mir; di cih de mir.
**Av negihat devê wî:**
- Bi heman wateyê.
**Axa wî ket wir:**
- Li wir mir.
**Axê kişand wir:**
- Bi heman wateyê.
**Bexçika xwe da hev:**
- Li ber mirinê ye.
**Bê melê jî çû:**
- Pir bilez mir; di cih de mir.
**Çavên wî ketin ser hev:**
-Mir.
**Çavên wî çûn ser hev:**
- Bi heman wateyê.
**Çavên wî hatin hev:**
- Bi heman wateyê.
**Çavên wî ketin hev:**
- Bi heman wateyê.
**Çavên xwe danîn ser hev:**
- Bi heman wateyê.
**Çavên xwe niqandin:**
- Bi heman wateyê.
**Çira ti kesî pêxistî namîne:**
- Wê her kes bimire. Bi taybetî dema hin dimirin tê gotin.
**Dema mirî dimire gorzêrînî dibe:**
- Heta sax in, heta li cem wan in qîmetê wan nagirin, pişt re qîmet didin wan.
**Dilê min şewitî:**
- Zarokên min mirin.
**Dilê xwe bi dinyayê xweş neke:**
- Dawiya her kesî mirin e; emê tev bimirin; xwe bi malê dinyayê mezin neke!
)Dema hin pir behsa xweşiya dinyayê dikin, hingê tê gotin)
**Dinya beredayî ye:**
- Dawiya her kesî mirin e; emê tev bimirin.
(Dema mirovek dimire hingê tê gotin)
**Dinya betal e:**
- Bi heman wateyê.
**Dinyaya ronî lê tarî bû:**
- Mir; mezixî.
**Dinyaya derewîn/dinya derewîn e:**
- Dawiya her kesî mirin e; emê tev bimirin.
(Dema mirovek dimire hingê tê gotin)


Ji Pirtûka Ferhenga Biwêjan Ya Diyar Bohtî



## ‘CPT bi bêdengiya xwe dibe hevkara sûcê tecrîdê’

Tecrîda girankirî ya li ser Rêber Abdullah Ocalan di nava qadên navnetewî de dengvedanek daye teysandin. Faşîzma Tirkiyê bi tewanên ji rastiyê dûr tecrîda girankirî ferz dike.**R-4**

## ‘Bi rihê şoreşa Jin Jiyan Azadî wê siyaseta darvekirinê têk biçe’



Endama Kordînasyona Kongra Star Remziya Mihemed diyar kir ku rêjîma Îranê li hemberî her kesê ku serê xwe radike, bi taybet li hemberê jinên çalakvan siyaseta darvekirinê dide meşandin.**R-2**

Ronahî
Şopdara Rastiyê ye
Rojnameya siyasî, civakî û çandî Jimar : 1194 11-Tebax-2024 www.ronahi.net/ku/ Nirx: 500 L.S

## ‘Ji bo Azadiya Rêber Apo pêwîste her kes bi erkê xwe rabe’



Endamê Însiyatîfa Surî ya Azadiya Rêber Abdullah Ocalan Silêman Ehmed diyar kir ku pêwîste her kes tevlî qada azadiyê bibe û erkên xwe yên li hemberî Rêber Apo pêk bînin û got: “Çawa ku Rêber Apo heya roja îro erka xwe pêk anî pêwîst e em jî azadiya wî wekî erkekî bidin pêşiya xwe.”**R-6**

# HEVGIRTINA GELÊN HERÊMÊ Û QSD’Ê BERSIVA HERÎ XURT YA LI DIJÎ ÊRIŞAN E

Bi armanca têkbirina aramî û ewlehiya herêmê, komên çekdar yên girêdayî hikumeta Şamê di 6’ê Tebaxê de êrişî gundewarên rojhilatê kantona Dêrazorê kirin û di encamê de gelek welatî şehîd û birîndar bûn, herwiha gelek ziyanên madî çêbûn. Li hemberî êrişan careke din QSD’ê ax û gel parast û êriş têk birin. Gel û êlên herêma Dêrazorê jî li dijî êrişan helwesta xwe nîşan dan û diyar kirin ku ew ê heta dawiyê li kêleka QSD’ê bin.**R-3**











## Cil û bergên ermeniyan; sembolek ji çanda wan ya kevnar e



Hevseroka Meclisa Civakî ya Ermenî ya Qamişlo, Kohar Xecadoriyan da zanîn ku cil û bergên ermenî yên ku bi navê Daraz tên nasîn, beşeke girîng e ji kiltûr û folklora ermenî û çandeke ji kevnariya sedê salan e.**R-7**



## Di salvegera 10’an ya plana bêbext de pêş dîtinek

Rojek serê sibê ku “leşkerên mirinê” berê xwe dan vê axa tijî nalîn, mirin bû deriyê tekane. Ji ser 3’yê Tebaxa 2014’an 10 sal derbasbû jî, ji êşa xwe tiştek winda nekir. Belê “Dem dermanê her tiştî ye” pir gotineke klasîk be jî rastiyeke din li kêleka vê gotinê ye ku êş li ser kîjan rih û mêjî bi çi mezinahî, ango giranî rûniştiye divê em zanibin.**R-5**



Ahmed Aktaş
15’ê Tebaxê, Kurdistan zindî kir *R-4*



Idrîs Henan
Pêwîste Rejîma Sûriyê Ji Yek Heya Deh Bijmêre! *R-5*



Hafiz Ahmet Turhalli
Fîşekên azadiyê *R-6*

# ‘Ji bo Azadiya Rêber Apo pêwîste her kes bi erkê xwe rabe’

Endamê Însiyatîfa Surî ya Azadiya Rêber Abdullah Ocalan Silêman Ehmed diyar kir ku pêwîst e her kes tevlî qada azadiyê bibe û erkên xwe yên li hemberî Rêber Apo pêk bînin û got: “Çawa ku Rêber Apo heya roja îro erka xwe pêk anî pêwîste em jî azadiya wî wekî erkekî bidin pêşiya xwe.”

**Birûc Resûl/Qamişlo**

Desteya Tenduristiyê ya Rêveberiya Xweseriya Demokratîk ji bo nirxandina bandorên tecrîdê yên li tenduristiya Rêber Abdullah Ocalan bi dirûşma “Tecrîd xetereya herî mezin a li ser tenduristiya mirovan û binpêkirina mafên herî bingehîn ê jiyanê ye”. Zêdetirî 500 bijîşk, endamên sendîkayên tenduristiyê, Heyva Sor a Kurd, xwendekarên Fakulteya Tibê ya Zanîngeha Rojava û hiqûqnas tevlî konferansê bûne. Derbarê konferansa Desteya Tenduritiyê ya têkildarî tecrîda li ser Rêber Apo hat lidarxistin, endamê Însiyatîfa Surî ya Azadiya Rêber Abdullah Ocalan Silêman Ehmed ji Rojnemeya me re axivî.

### ‘Rêber Apo bi fikirê xwe Îmraliyê kiriye cihê zanistê’




Silêman Ehmed di daestpêka axaftina xwe wiha got: “Ev 3 sal û 5 meh in bi ti awayî agahî ji Rêber Abdullah Ocalan nehatiye girtin. Ji lewra dema ku agahî nayê girtin dibe cihê gumanan, bi taybet gelê Kurd û her kesên ku dilê wan ji bo Azadiya Rêber Apo lê dide xwedî guman in. Ji xwe bêdengiya saziya ‘CPT’ û saziyên hiqûqnas bi serê xwe pirsgirîkek cidî ye, her wiha Desteya Insyatîfa Surî xwest bal bikşîne li ser rewşa Rêber Abdullah Ocalan ya tenduristiyê, lê hîna jî ti agahî jê ne hatiye girtin. Tecrîda girankirî ya ku tê meşandin ku Pergala Îmraliyê, pergalekî wiha ye ku mirov nikare bi hesanî di bin şertên wê li ber xwe bide û jiyana xwe bidomîne. Lê Rêber Apo wiha kiriye ku navenda Îmraliyê bike, navenda zanistî û felsefeya jiyana azad. Ger mirov li gera dîrokê binêre ji destpêka şaristaniyê heyanî şaristaniya kapîtalîst, di serdema hişmendiya destlhilatdariyê de komplo wekî amûrekî bi pêşdebirina desthilatiya xwe hatiya bikaranîn. Cara yekem komplo ji hêla kesên serdest ên moderntiya kapîtalîzm bi rêve dibin, hatiye dîtin ku bi awayekî baş bikaribin pergala xwe bixin di bin misogeriyê de.”

### ‘Rêber Apo li beramberî sîstema kapîtalîzmê tekoşîneke bê hempa dide meşandin’

Silêman Ehmed diyar kir ji bo azadî û wekheviyê gelê kurd li ber xwe didin û riya komplo didin girtin û wiha got: “Armanca kesên serdest, mêtînger ew e ku civak ji nirxên wê yên kevneşop biyanî bikin û xwe li ser pişta gelan bi vî rêbazî dagir bikin. Bêguman ev bû 23`ê sal in ku Rêber Apo li beramberî sîstema kapîtalîzmê tekoşînekî bê hempa dide meşandin. Têkoşîneke bihtirî 50 salî li dijî vê pergala kapîtalîzmê dide meşandin. Lewma hem hêzên serdest û hem jî dewleta Tirk a dagirker rê nadin Rêber Apo ku hevdîtin bi parêzer û malbetê re pêk were. Ji ber ku dizanin ger hevdîtin çêbibe, bandora Rêber Apo wê li Rojhilata Navîn û giştî Kurdistanê ji bo çareseriya Netewa Demokratîk hîn bi leztir bibe bersiv. Ji ber vê yekê ye fikir û fesefeya Rêber Apo li pêşiya berjewendiyên xwe asteng dibînin. Rêber Apo di got: “Dewlet rê nade yek gotinên min derkeve dervî giravê.” , ev jî tê wateya ku şerê herî dijwar li girava Îmraliyê tê meşandin. Heya roja niha jî Rêber Apo di tecrîdeke sîstematîk re derbas dikin, ev jî hem ji bona cihê ku lê dimîne û hem jî li ser tenduristiya wî xeteriyek dide avakirin.”

### ‘Hewaya Îmraliyê’

Silêman di berdewamiya axaftina xwe de wiha got: “CPT bi xwe jî di qanûna xwe de bi cih kiriye ku rewşa tecrîdê divê ne zêdetirî 14 rojan bê û ger dirêjtir kir wê demê dibe îşkenceyekî sîstemîk. Di heman demê de li ser riya zoomê me bi gelek kesayetên navdar re jî di derbarê Rewşa Rêber Apo ya tenduristiyê gotûbêj kirye, bi xwe jî nerînên ku derketina holê bi vî rengî bû: Eger bi awayekî her demî ev îşkence were meşandin wê li ser rewşa Rêber Apo ya fîzîkî jî xeteriyekî mezin hebe, ev jî bi sedemên hewaya îmralî ye. Ji ber ku hewaya Îmraliyê hewayekî şilî ye ku mirov di nava şiliya deriya yê de dijîn, her wiha ev metirsiyan li ser jiyana însanan dide avakirin, hem jî bi demê re nexweşiyên çerim çêdike û gelek mînakên bi vî awayî. Ji xwe berê jî Rêber Abdullah Ocalan bi nav kiribû: “Hucreya jehrkirina jiyana însanan”. Ji lewra ev jî bi serê xwe pirsgrîkeke ku pêwîst bû heya niha li ser hatibane sekinandin.”

### Konferansa Tendirustî

Ehmed da zanîn ku temenê Rêber Apo bûye 75 sal û pîwîste ev tecrîd li ser were rakirin û wiha anî ziman: “Tevî ku gelek bijîşk derbasî Kurdistanê bûn li sere rewşa Rêber Apo nameyên tendirustî nivîsandin, di hemn demê de name ji dewleta Tirk a dagirker re dinvîsandin, lê dewleta Tirk ev mijara nedaye ber çav û di siyaseta xwe ya îşkenceyê de israr dike. Me di van demên dawî de Konferanas ya di derbarê rewşa Rêber Ocalan de li darxist, bê guman di konferansê de nêzî 500 bijîşk amede bûn û gelek nerîn xwe dane pêş. Ji xwe di Konferansa ku me li darxistibû hemû kes û saziyên cuda têde cihê xwe girtin, di heman demê de Heyva Sor ya Kurdî jî cihekî xwe yê teybet di vê Konferansê de girt. Dîse saziya alîkariya girtiyan û Insiyatîfa Surî ya Azadiya Rêber Apo jî cihê xwe girt, di heman demê de însyatîfa parezeran ya hiqûqî jî amede bûn. Ji lewra di Konferansê de nerînên Kûr ji bo rewşa Rêber Apo derketin holê. Di heman wextî de bang ji gelak aliyan hate kirin ku ji bo azadiya fîzîkî ya RêberApo rol bigrin ser xwe û ji nûve mijara zindana li ber çav were derbaskirin ku rewşa girtiyan ji nûve were bi destgirtin.”

### ‘Têgînin ku em bikar bînin’

Silaêman Ehmed balkişand ser nexandin û biryarên ku di konferansê de hatin dayin û wiha got: “Di Kinferansê de hin rexne li ser hin têgînên ku em di jiyana rijane de bi kar tînin çêbûn, mînek em gotina binçavkirin pir dibêjin, lê bi serê xwe ev gotin şaşe û lazime wekî fêrbûn dinava civakê de çênebe. Gotina



rast ew e ku em bibêjin Rêber Apo ji milê dewleta Tirk a dagirker ve hatiye revandin. Ji lewra konferansa me biryar girt ku li ser van têgînan rawestin, em nebêjin binçavkirin lê em dikarin bêjin revandin. Ji lewra pêwîste em hemû li gorî van biryaran tev bigerin.”

### Biryarên ku hatin girtin

Di Konferansê de 7 xalên sereke wekî biryar hatin girtin û ew xal wiha ne:

- Pêwîst e em mijaran bi ser navê wê yê rastiyê bêjin.
- Li ser asta Rêvberiya Xweser kar û xebat bi awayekî her demî ji bo azadiya fîzîkî ya Rêber Abdullah Ocalan bê kirin.
- Dewleta Tirk a dagirker ku li gorî zagon û Hiqûqê navnetewî nêzî mijara Rêber Apo bibe.
- Pêwîst e CPT ji bo azadiya Rêber Apo tevahî zindaniyan kar bidê meşandin û bi awayekî acil biçe serdana îmraliyê, her wiha rewşa Rêber Apo raghîne.
- Pêwîst e CPT her dem raporan di derbarê Rêber Apo de derbixe û ji bona raya giştî raghîne.
- Mafê hêviyê ji hemû zindaniyan re werê dayîn ku nerîna xwe bi awayekî rehet bîne ziman, di heman demê de biryar were girtin ku çi mirovekî ku temenê wî bigihîje 70 salî were berdan, ev xal jî ji bo rewşa Rêber Apo re derbasdare.
- Pêwîst e her kes xwe li gorî rastiya Rêber Apo xwe pêş bixe di çalakiyan de çihê xwe bigre.

### ‘Azadiya Rêber Apo erka me ye’

Endamê Însiyatîfa Surî ya Azadiya Rêber Abdullah Ocalan Silêman Ehmed di dawiha axaftina wiha got: “Ji bo azadiya fîzîkî ya Rêber Abdullah Ocalan em wekî Insyatîfa Surî armanca ku me daye pêşiya xwe û pêwîst e bi serbikefe. Em bang dikin ku her kes tevlî qada azadiyê bibe û erkên xwe yên li hemberî Rêber Apo pêk bînin. Çawe ku Rêber Apo di demê xwe de û heya roja îro erka xwe pêk anî pêwîst e em jî azadiya wî wekî erkekî bidin pêşiya xwe.”

## Fîşekên azadiyê



Hafiz Ahmet Turhalli

Gelê Kurd pişti 1938 an di têkoşîna xwe ya Netewîde, nefes û hêza xweya leşgeri û çekdarî li bakurê Kurdîstanê wenda kir.
Ji serîhildana Şeyx Seîd heta ya Seyîd Riza, kar û barên berxwedana leşgeri berdewam dikirin. Piştî têkçûna serhildana Dersimê, dewleta dagirker ya Tirk; xwe di erdnîgariya Kurdîstanêde wek dagirkerekî xwînxwar li Welatê me cîbicîh kir. Bi plana tunekirina Kurd û Kurdîstanê, Tirkitiyekî bi darê zorê, li millet hate pêçandin. Bi vê plana darê zorê, Neteweyên dîtir hemû hatin yekalîkirin û Tirkitiyekî sexte hate bicîhkirin. Piştî serîhildana Seyît Riza, karê tunekirina çand, ziman, dîrok û Kurdayetî bi rengekî kur hate meşandin. Asîmîlasyon û oto asîmîlasyon di nava Kurdande jî, bilezûbez hate pêşxistin. Lewre li gor dewleta Tirk, qirkirin û têkbirina Kurdan ya leşgerî hatibû biserxistin. Kurdistan wek mezelekî ji beton hatibû xêzkirin û li ser wê jî ev hatibû nivîsandin: “Kurdîstan divê mezelê de hatiye binaxkirin”. Xweliya mirinê li ser me Kurdan hatibû rişandin û Kurd bi saxitî hatibûn binaxkirin.
Gelê Kurd di hêla leşgerî, aborî, çandî, olî, gelerî, zimanî de ketibûn ber mengeneya dewleta Tirk û ji hêla derûnî û psikolojîk jî hatibûn şikestin.
Di vê rewşa mirî û binaxkirîde, li beramber dewleta Tirk, fîşek teqandin û dijî vê hovîtiyê serî rakirin weke mûcîzeyekî hate pêkanîn. Ev mûcîze bi teqandina fîşeka li Eruh û Şemdînliyê erdhejekî, ruhî, fikrî û jiyanî bixwere anî. Dewleta Tirkanjî bixwe bawer bû ku di van çil û şeş salên bihûrî de, Kurd hatine tunekirin û bûne Tirk. Dema ev fîşek li leşkerên dagirker ketin, bandora wê tenê ne li ser laşe neyarên hov çênekir? Berovajî wê li ser hebûna dewletê bandor çêkir. Bandora wê ya herî mezin li ser gelê Kurd çêbû. Civaka Kurd ku ji hêvî û jiyana azad hatibû bêparkirin, dîwarên tirs û bê hêvîtiyê di mejî û dilê wê de hatibûn avakirin, hatin serûbin kirin.
Bi van fîşekan perdeya derewan ku dewletê ser heqîqeta millet û welatê me hatibû bicîh kirin, hate çêrandin û perçekirin, dilê welatperwer û aşiqên azadiyê hate germ kirin, tirsa ser gelê mejî hate rakirin. Van fîşekan tirsekî mezin di dilê xayîn û dewletêde ava kir. Erdhejekî di şîdeta dehande çêkir û dewlet serû bin kir. Ev fîşekên ku pazdehê tebaxê hatin teqandin, çavên Kurdan û azadîxwazan ronî kirin, dîwarê tirsê û bê hêvîtiyê ji binîve xera kirin. Van fîşekan; başurê Kurdîstanê derî li statuyê vekir, li Rojava bingeha fikir û ramana azadiyê bicîh kir, li Rojhelat buye tirsa neyaran û li bakur xîmên dewleta Tirk jibinî, bê wate kir.
Divê Milletê me hemû bihevre, vê vejîna xwe pîroz bike. Ev vejîn ne tenê teqandina fîşekekiye; ev vejîn belavkirina taritiya ser laş û ruhê meye.
Çil saliya vê vejînê divê weke têgeha azadiya hemû Kurdan were dîtin û pîroz kirin. Lewra fikr û ramanê azadiyê bi nirxe û ev ramana çil sale, li beramber hemû zilm û zordariyê berxwe dide.
Divê Kurd vê vejînê bikin malê hemû mirovahiyê! Ger azadî tunebe, tu wateya mirovî nîne! Mirov tenê bi azadiyê kare bibe xwedan nirx.
Mezelê dagirkeran ji bo me çêkiribû hate qelaştin û bêhna azadiyê tê.
Vejîna azadiyê li me û hemû gelên bindest pîroz be.



# Êrişên hovane yên li ser rojhilatê Dêrazorê dewam dikin

Bi armanca têkbirina aramî û ewlehiya herêmê, komên çekdar yên girêdayî hikumeta Şamê di 6’ê Tebaxê de êrişî gundewarên rojhilatê kantona Dêrazorê kirin û di encamê de gelek welatî şehîd û birîndar bûn.

**Navenda Nûçeyan**

Bi armanca têkbirina ewlehiyê herêmê , di şeva 6’ê Tebaxê de komên çekdar yên girêdayî hikumeta Şamê li dijî 12 bajarok û gundewarên rojhilat ên kantona Dêrazorê êriş pêk anîn, ew bajarok û gund topbaran kirin.

### Destpêkirina êrişan

Di şeva sêşem-çarşemê de komên çekdar yên girêdayî hikumeta Şamê ji baregehên xwe yên li gundewarên Meyadîn, Bûkemal û herêma Eşare bi çekên giran bajarokên gundewarên rojhilat ên kantona Dêrazorê ya Herêma Bakur û Rojhilatê Sûriyeyê topbaran kirin.
Derdora bajarokê Zîban, Şihêl, Teyane, Dernec, Ebû Herdob, Ebû Hemam, Letwa û Xeranîc ên rojhilatê kantonê hatin topbarankirin. Li hember wê Hêzên Sûriya Demokratîk (QSD) tedbîrên xwe girtibûn.
Çavkaniyên xwecih ji herêmên hikumeta Şamê da zanîn ku hemwextî topbaranê, komên girêdayî hêzên hikumeta Şamê ji nuqteyên xwe yên gundên Beqres Foqanî, Beqres Tehtanî, Qoriye û Sibîxan hewl da bi keştiyan bikevin herêmên Rêveberiya Xweser.
Navenda Ragihandinê ya QSD’ê ragihandibû ku di şeva sêşem-çarşemê de di encama topbarana ketober de 2 welatî şehîd bûn û 7 din ji nav wan 2 zarok, birîndar bûn.



### Bersivdayîna êrişan

Li hember wê, hêzên Meclisa Leşkerî ya Dêrazorê hewldana derbasbûnê têk bir û di encamê de di navbera herdu aliyan de şer derket. Şer û êriş li bajarokên Ebrîha û derdora Bisêra, Zîban, Şihêl, Teyane, Ebû Herdob, Ebû Hemam, Letwa û Geranîc bû.
Şer 4 saetan dom kir, piştre QSD’ê hewldan bi temamî têk bir û 8 êrişkerên Dîfa Wetenî kuştin. Ji wan cenazeyên 3 kuştiyan ketin destê QSD’ê. Her wiha 16 jî birîndar bûn û yên din ber bi herêmên xwe ve reviyan.
Danê nîvroj ê komên çekdar yên girêdayî hikumeta Şamê stasyona avê ya El Omer a li rojhilatê taxa Letwa û stasyona avê ya Ebû Hemam a ku avê ji 4 hezar malbatan re peyda dike, topbaran kirin. Di encamê de herdu stasyon ji xizmetê derketin.
Piştî aramiyeke demkî û destpêkirina operasyoneke paqijkirinê û lêgerîna li êrişkaran ji hêla QSD’ê û Hêzên Ewlekariya Hundirîn ve careke din şeva pêncşem û înê Dîfa El Wetenî êriş kir.
Di wê şevê de bajarokê Ebrîha, Sebhe û gundê Dehle yên li rojhilatê Dêrazorê hatin hedefgirtin, di encamê de zirarên madî çêbûn.
Li hember vê topbaranê QSD’ê jêderên topbaranê yên Dîfa El Wetenî hedef girtin.

### Komkujiya Cidêdit Begara û Dehle

Sibeha roja înê komên çekdar yên girêdayî hêzên hikumeta Şamê û gundê El Bûlêl, Cidêdit Begara û Dehle yên rojavayê çemê Firatê topbaran kirin.
Di wê topbaranê de 2 komkujî li Dehle û Cidêdit Begara pêk hatin. Di encamê de 11 sivîl şehîd bûn û 5 din birîndar bûn.
Di merasîma veşartina şehîdan de jî hêzên hikumeta Şamê goristana Dehle topbaran kir. Di encamê de şênî neçar man ku bi awayekî lezgîn şehîdan veşêrin.
Hîn jî qedexeya çûn û hatinê ya ku Hêzên Ewlekariya Hundirîn li Dêrazorê pêk ragihandibû didome. Hemwextî wê QSD’ê xebatên şopandin, lêgerîn û lêpirsînê li herêmê didomîne.
Bîlançoya êriş û topbarana hêzên hikumeta Şamê û Dîfa El Wetenî li dijî gundewarê Dêrazorê di 72 saetên borî de wiha ye: 13 sivîl şehîd bûn, ji wan zarok hene. 12 jî birîndar bûn. 2 stasyonên avê ji xizmetê derketin û zirarekî madî bi mal û milkên welatiyan bû.

### Navên şehîd û birîndaran

Li gorî belgeyên nexweşxaneyan û li gorî dema şehîdbûna wan, navên şehîdan wiha ne:
Îmad Celal El Hetab, Heysem Yûsif Îd, Îsmaîl El Ebûd (12), Nadye Xidir El Mihemed (18), Hind Ferhan El Ebûd (30), Aye Îsmaîl El Ebûd (8), Nadîn Tilêc El Ubêd (22), Yas Yasîn El Zeir (37), Mariya Yasîn El Zeir (12), Selwa Yasir El Zeir (5), Rexed Mihemed El Zixîr (22), Şam Beşar El Zixîr (4 meh) û Îlaf Beşar El Zixîr (salek û nîv).
Navên birîndaran jî wiha ne:
Emar El Yasir (17), Ehmed El Xelîl El Mihemed (9), Elî Hesen El Damin (12), Melek Ebûd El Husên (25), Sûriye El Ebûd (50), Fehid Îsmaîl El Ebûd (15) û Melek Îsmaîl El Ebûd (6).
Di aliyên civakî û siyasî de eşîr û gel bertekên xwe yên şermezarkirinê nîşan dan, bi taybet eşîrên Ereb ên gundewarê Dêrazorê.

### Helwesta gel û êlên Dêrazorê li hemberî êrişan

Meclisa Eşîrên El Bûkemal bi daxuyaniyekê êrişên komên çekdar yên girêdayî hêzên hikumeta Şamê li ser herêmê şermezar kirin û armanc ji van êrişan têkbirina îstîqrariyê û xurtkirina çalakiyên DAIŞ’ê ye. Herwiha Meclisa Eşîrên El Bûkemal da zanîn ku ew amade bi QSD’ê re parastina herêmê bikin. Meclisê di daxuyaniya xwe de got armanca ji van êrişan derxistina fitneyan di nava pêkhateyên herêmê de û qelskirina destkeftiyan e, her wiha bang li tevahî xelkê herêmê hat kirin ku bi QSD’ê re hevgirtî bin ku ewlehî û îstîqrarê biparêzin.
Li aliyekî din rûspiyên êla Igêdat jî bi daxuyaniyekê diyar kir ku ew li kêlek QSD’ê ne û QSD’ê ji bo rizgarkirina herêmê ji terorê hêza yekane bû û berdêlên mezin dan. Herwiha rûspiyên dan xuyakirin ku sebra wan neceribînin, ew û QSD’ê yekîneyeke hevgirtî ne.
Gelên gund û bajarokên rojhilatê Kantona Dêrazorê li dijî êrişên hovane yên komên girêdayî hikumeta şamê û hêzên bi ser wê ve daketin qwadan û êriş şermezar kirin. Herwiha dan xuyakirin ku ew ê hertdem li kêleka QSD’ê xaka xwe ji her êrişkê biparêz in.
Hjayî bibîrxistinê ye ku gelek caran komên girêdayî hikumeta Şamê ji bo têkbirina armî û ewlehiya herêmê êrişî gundewarên rojhilatê Dêrazorê kirine, lê her car bi berxwedaniya QSD’ê û hevgirtina gelên herêmê planên êrişkaran têk diçin.

# Di 8 mehan de li Îranê 345 kes hatine darvekirin

**Navenda Nûçeyan**

**Ofîsa Komîseriya Bilind, der barê darvekirinên li Îranê agahî parve kirin. Komîseriya Bilind destnîşan kir ku di Tîrmehê de 38 kes li Îranê hatine darvekirin û got: “Hejmara kesên ku îsal hatine darvekirin gihîştiye 345 kesan. 15 kes ji wan jin in.”**

Li gorî Neteweyên Yekbûyî (NY), ji destpêka sala 2024’an û vir ve nêviyê darvekirin ku hatine kirin ji ber sûcên hişbirinê ne. Berdevka Komîseriya Mafên Mirovan a NY’ê Lîz Throssell li Cenevreyê daxuyanî da û got: “Komîserê Bilind ê Mafên Mirovan ê NY’ê Volker Turk ji van raporan gelekî bi fikar e. Ev hejmara darvekirinê ya ku di demek kin de pêk hatiye mirovan dixe nava fikaran.”
Berdevkê Komîseriyê ev tiş anî ziman: ”Pêkanîna darvekirinên derveyî kuştinên qestî ne li gorî pîvanên mafên mirovan ên navnetewî ye.”
Throssell destnîşan kir ku Ofîsa Komîseriya Bilind jî ji ber “nebûna pêvajoyek dadmend û darizandinên adil” bi fikar e û got: “Di gelek bûyeran de, bêyî ku malbat an parêzerê girtiyan agahdar bikin gelek îdam pêk hatin.”
NY’ê gelek caran bang li Îranê kir ku bi cezayê îdamê rake û darvekirinan rawestîne. Çalakvanên mafên mirovan bertek nîşanî bikaranîna cezayê darvekirinê ji aliyê Îranê ve weke amûreke tirsandinê li dijî serhildana Jin Jiyan Azadî tê bikaranîn, dan.
Di nava hefteyê de, Rêxistina Mafên Mirovan a Îranê (IHR) ku navenda wê li Norwêçê ye diyar



kir ku di 7’ê Tebaxê de li Kerec a nêzî Tehranê 26 kes bi awayekî komî hatine darvekirin û di heman rojê de 3 kes jî li girtîgehên din ên heman bajarî hatine darvekirin.

# ‘CPT bi bêdengiya xwe dibe hevkara sûcê tecrîdê’

Tecrîda girankirî ya li ser Rêber Abdullah Ocalan di nava qadên navnetewî de dengvedanek daye teysandin. Faşîzma Tirkiyê bi tewanên ji rastiyê dûr tecrîda girankirî feriz dike. Jinên Kurd tekez kirin ku ji bilî felsefeya Rêber Apo ti çareserî ji pirsgirêkên cîhanê re nîne.



Elîf Mihemed



Delal Şêxo

**Zana Roj/ Şehba**

Di dirêjahiya 25 salan ji dîlgirtina Rêber Abdullah Ocalan de, faşîzma AKP û MHP’ê her dixwaze Rêber Apo di nava dîwarên Îmraliyê de bi gelê kurd bide jibîrkirin. Rêber Abdullah Ocalan bi destpêkirina têkoşîna azadiya Kurdistanê re û bi felsefeya azadkirina mirovahiyê ji lepên sîstemên gilobal yên modernîteya kapîtalîzimê, ji cîhanê re da xuyakirin ku ev serdem serdema pêkanîna edaleta mirovahiyê li hember hêzên cîhanî û serdema ku Kurd rabin ser piyan û di doza rizgarkirina Kurdistanê de gavên têkoşîn û serkeftinê bavêjin.

Faşîzma Tikr êdî di wê baweriyê de ye ku felsefya Rêber Apo sînorên Îmraliyê derbas kiriye. Di ferizkirina tecrîda li ser Rêber Apo de îradeya gelê Kurd û şopkarên vê riyê digire hedef. Careke din bi gotina (cezayên disiplînê) dixwaze tecrîda girankirî ya li ser Rêber di cîhanê de weke ku tune ye nîşan bide.

Bê guman li hember siyaset û pilanên di Îmraliyê û di navnetewî de li dijî Rêber Abdullah Ocalan tên kirin, gelê Kurd li çar aliyê cîhanê bertekên cidî bi riya çalakiyên ku tên kirin dide raber kirin. Jinên Efrînê yên ku cihê xwe di nava xebatên vê şoreşê de digirin Elîf Mihemed û Delal Şêxo li Kantona EFrîn û Şehbayê di vê derbarê de helwestên xwe ji rojnameya me re anîn ziman.

**Tevgera Azadiyê Siyaset û pilanên AKP û MHP’ê têk birine**

Elîf anî ziman ku wê tu siyaset li hember îradeya gelê Kurd nebin bend û wiha got: “Di mijara girtina Rêber Apo de faşîzim li hember têkbirina vîn û îradeya gelên ku li ser şopa vê xetê meşiyane biser biketa. Di oxira xwebirêxistinkirin, têkoşîn meşandin, felsefe belavkirin û mayîndekirina doza rizgariya Kurdistan di cîhanê de gelek bedelên giranbuha hatin dayîn. Di têkoşîna zêdetirî 50 salî de tevgera azadiyê sîstem û siyaseta faşîzma AKP û MHP’ê bibinxistiye. Faşîzim ji berxwedaniya ku di nava qêrînên zîndanan de hatiye raber kirin û heyanî vê kêliyê bi tu awayî di valaderxistina vê têkoşînê de bi ser neket. Ev têkoşîna bi ked û emeka Rêber Apo hatiye destpêkirin, pilanên dîrokî yên osmaniyên nûjen bibin xist.”

**`Pêwêste CPT bi erkê xwe rabe’**

Elîf diyar kir ku siyaseta ku tecrîd pê tê meşandin ne ji zagon û pîvanên girtiyên siyasî ye û wiha pê de çû: “Di serdema 21’emîn de binpêkirinên herî ber bi çav ji aliyê hêz û rêxistinên navnetewî yên ku banga demokrasiyê dikin di şexsê Rêber Abdullah Ocalan de pêk tînin. Di Îmraliyê de tu pîvan û zagonên rêxistinên têkildarî mafê girtiyan bi gelemperî û yên girtiyên siyasî bi taybet pêk nayên, Rêber Ocalan rûxmî ku girtiyekî siyasî ye lê Hikumeta Faşîst bi erkên xwe yên li hember rêbertî ranabe. Bê guman ev yek him ji aliyê CPT û rêxistinên têkildar ve gelek caran hatiye şopandin û dîtin, lê tu parvekirin û daxuyaniyên ku zextê li ser Faşîzma Tirkiyê bê kirin nehat raber kirin. di vê alî de Rêxistina CPT ê cûcdare û divê li hember vê siyasetê û helwestên ku ji gelê Kurd, siyasetmedar, rewşenbîr û dewletên ku ji bo Azadiya Fîzîkî ya Rêber APO rabûne ser piyan raber bikin”.

**‘Felsefeya Rêber Apo bûye gerdûnî’**

Delal Şêxo jî destnîşan kir ku faşîzma Tirkiyê wê ne bi tecrîd û ne jî di hedefgirtina Gerîlayên Azadiyê di pilanên xwe de bi ser bikeve û wiha got: “Li hember helwestên Gelê Kurd û têkoşîna Azadiya Kurdistan de gelek pilanên dîrokî ji aliyê hêzên Kompiloger û faşîzma Tirkiyê ve hatin organîzekirin; lê ev pilan bi tu awayî negihîştin encamên ku wan hêvî dikin. her çiqas ew siyaset li hember gelê Kurd di şexê Rêbertî de hate pêkanîn, ewqas felsefe û îdeolojiyê Rêbertî di nava gel û gelê azadîxwez de hate belav kirin. Bi tewanên derew, bi cezayên disiplînê, bi ferizkirina tecrîdê û nedadgehkirina Rêbertî ev hemû rêbazên têkbirina îradeya Rêbertî û ya gelê Kurd bûn.

Her wiha di berdewamkirina wê siyasetê de êrîşên herî giran li ser Qadên Paeastinê yên Medyayê dane meşandin û heyanî niha jî ev yek bi rêbazên herî wehşî û bi teknîkêm qedexekirî tên domandin. Gelo me dest ji berxwedanî û têkoşîna ji bo Azadiya Fîzîkî ya Rêber APO û ya doza azadiya Kurdistan ber da? Bêguman na.

Ger em di roja îro de dibînin ku çalakvan û azadîxwazên di qadên navnetewî û bi milyonan gelê Kurd di cîhanê de ji bo azadiya fîzîkî ya Rêber APO daketine qadan; ev yek serkeftina Felsefeya Rêber APO di cîhanê de misoger dike, ji ber felsefeya demê ya ku bibe çareserî li hember hemû pirisgirêkên cîhanê û yên mirovahiyê; felsefe û pirojeya Rêbertî ye. Ji lewra em jin û gelê ku bi felsefeya Rêbertî re mezin bûne û hebûna xwe di vê îdeolojiya dibînin, bang li gelên welatparêz, hêz û rêxistinên navnetewî yên mafê girtiyan û mirovahiyê dikin ku li hember dengê milyonan ji kesên azadîxwaz bibin xwedî bersîv û bi erkên xwe rabin.”

# Şerê Cîhanê Yê Sêyemîn

**Volqan Elî**

Di roja me ya îro de, yanî çaryeka destpêkê ya sed sala bîst û yekemîn, êdî şer wekî berê nayên meşandin. Ruxmî ku Şerê Cîhanê yê Sêyemîn di salên 1990’î de bi şerê Kendavê dest pê kiriye, niha mirov ji welatiyekî/e ji rêzê yê cîhanê bipirse, ew ê “bêje ti şerê cîhanê filan nayên meşandin”. dibe ku hêzên azadiya gelan bi xirabiya şer hesiyabin, heta wekî hêzên Şaristaniya Demokratîk ev şer wekî şerê cîhanê yê sêyemîn jî bi nav kiribin jî, hêzên hegemon ku şerê cîhanê yê sêyemîn dimeşînin di wê astê de bi ser keftî dixebitin, ji bilî hêzên azadiya gelan, hêzên xeta seyemîn ti kes ne di ferqa vî şerî xwînavî de ye. Mînak, ji Kurdistanê, Efxanîstan, Ûkrayna, Filistîn bigire heya bi welatên Afrîkayê di nava çend salan de bi sedan hezar kes hatiye kuştin. Armanca me ne ew e ku em bêjin ewqas kes hatine kuştin wê demê ev jî şerekî mezin ê cîhanî ye, na. Hedefa me ew e ku em taybetmendiya vî şerî nîşan bidin.

Niha eger xwendevanek bêje, “ma em ê taybetmendiya vî şerî zanibin yan jî nizanibin çi feydeya wê heye?”, mirov nikare heq nede vê pirsê jî. Lê rastiyeke wisa jî heye; dema em taybetmendiya vî şerî nizanibin, em ê ji van eniyan li cem yekê ciyê xwe diyar bikin. Herî kêm bi helwesta xwe ya fikrî. Lê roja wê tê fikir, dibe zikir û çalakî. Jixwe fikir ji bo çalakiyê ye. Ya ji van hemûyan girîngtir jî em ê çawa û çi bifikirin, çi bikin, kî dostê gelan e, kî dijminê gelan e bizanibin û li gorî wê helwest bigirin, li gorî wê bikevin tevgerê. Ma em ê hosiya Zerdeştê Kal ji bîr bikin? “Rast bifikire, rast bibêje, rast bike!”. Niha, dema em li gorî vê li bûyeran nenêrin wêneyekî çawa derdikeve li ber çavên me? Em ê bêjin, “vaye, Îsraîl bi sûîqestê Haniye tasfiye kir. Hêza xwe nîşanî Îranê jî da”. Ew bi xwe dibêje “me derbeke mezin li hemû dijminên xwe dan”. Lê her tişt ne evqas safî û zelal e. Li gorî vê dîmenê, piştî Îranê û heta ji Îranê jî bêhtir, dilê Erdoxan û Bahçeli bi Haniye re ye. Lê wêneyê rast, bi îhtimaleke pir mezin ne wisa ye. Em ji ku dizanin? Yek, em dîrokê dixwînin. Dîrok çi ye? Şîroveya heqîqatê ye, şîroveya dema borî ye û diyarkirina pêşerojê ye. Ma di dîrokê de çi qewimîbû? Bi kurt û kurmancî ji beriya şerê cîhanê yê yekemîn, beşekî mezin ê welatê Eraban di bin destê Osmaniyên talanker de bû. Dema ku di sedsala 18-19. de girîngiya petrolê hate fêmkirin, Îngîltere berê xwe dabû Rojhilata Navîn û welatên Ereban. Lê ev herêm di bin dagirkeriya Osmanî de bû. Îngîlîzan girîngiya wê dizanîn ku xelkê Ereb li dijî Osmaniyan rakin, giregirên Eşîrên ereb wekî hevkarên xwe bi kar bînin. Bi kurtî di vê armanca xwe de bi ser ket û bi taybet jî ev bi peymanên şerê cîhanê yê yekemîn misoger kir. Gelê Ereb hema bêje hemû ji Osmanî qut kir û pergala Osmaniya şehitî. Tirkên faşîst wekî berpirsiyarê vê Ereban dibînin. “Împaratoriyeke qerase ji ber Ereban ji destê me çû”. Ew wisa difikirin.

ji ber vê yekê dewleta dagirker ê Tirk ê niha û Erdoğan, ji gelê Ereb, ji tevahiya Ereban wekî cinê wan bin hez nakin. Dixwaze bila Haniye be, dixwaze bila Mûrsî be yan jî Esad. Ma ne ti nemayibû Erdogan biçe li Şamê li mizgefta Emewî nimêja xwe bike! Dema dagirkeriya Tirk dibe mijar Kurd û Ereb û Fars ji bo faşîzma dewleta Tirk ne tiştek in. Yanî eger hêzên hegemon jê bixwazin Erdogan û Bahçelî dikarin her kesî bifiroşin. Niha ne ku pir Misilman in, bigire ji DAIŞ’ê hemû hêzên cîhadîst bi xwedî dikin, ji bo ku rojekê bifiroşin bi xwedî dikin. Ya duyemîn, em dizanin ku di vî şerê cîhanê yê sêyemîn de eniyên cemid ên klasîk tine. Yanî her hêz û dewlet li ser gelek benikan wekî sêhêrbaz dilîzin. Niha Tirkiye hem li ser benê Îslamiya radîqal e, hem li ser benê Pûtîn e û hem jî li ser benê Ewrûpa ye.

Di encam de ev şer, Şerê Cîhanê yê Sêyemîn bi temamî şerekî şer e; yanî dekûdolab û komplo û lîstok taybetmendiya bingehîn a vî şerî ye. Kîjan hêz li cem kê ye, kengê wê hev bifiroşin, sûda wan ji hev çi ye tenê ew dizanin. Hêzên gel, hêzên ku di eniya azadiya gelan de cih digirin, ne hewce ye ku bizanin hêzên şer çi difikirin, çi dizanin, çi dikin. Lê bi şertûmerca ku taybetmendiya xapînok, tev dekûdolab û komplo ya vî Şerê Cîhanê yê Sêyemîn were zanîn. Feydeya eniya azadiya gelan di wê de ye ku timî bide li pey berjewendiya gelên bindest, ji bo wê bifikire, ji bo wê helwest bi pêş bixe. Ew jî yekîtiya gelan e, neteweya demokratîk e.



## 15’ê Tebaxê, Kurdistan zindî kir

**Ahmet Aktaş**

Kurdistana ku ji aliyê dewleta tirka ve hatibû kuştin û li bin çiyayê Agiriyê xistibûn bin erdê, ser wê jî bi çimento seyandi bûn, bi pêngava 15ê Tebaxê re, ji bin erdê hat derxistin û hat zindî kirin.

Qasî pêngavê, jê zêdetir biryar standina vê pêngavê giring ê. Ev biryar bi biryara 1972’an li Bendava Çubuka Enqereyê hat standin ve girêdayî ye.

Ji ber ku wê rojê biryara rêxistinkirina Tevgera Azadiya Kurdistanê û dewama wê avakirina PKK’ê hat standin. Ji bo biryarek wisa bargiran, zanebûn, hostayîbûn û wêrekiyek gelek mezin lazim bû. Xwediyê van taybetmendî û kesayetiyên giranbiha rêveber in, Rêber Apo jî bi pêkanîna vê civînê, ev huner û kesayetiya bi rûmet da diyar kirin.

Desthilat û mêtingerên Kurdistanê bi vê bûyerê hisyan û hema xwestin bi lez, serîhildana zîndana Amedê ya dewama vê biryarê, bişkînin û dîsa Kurdistanê binerd bikin.

Lê na xêr, ew heyvanê wê bîrdozî û viyana şoreşgerî ya ku Rêber Apo dabû hevalên xwe, di mejiyê wan de meyiya bû û bi vê hişmendiya bilind, li dijî faşîzma 12’ê Îlonê serî hildan.

Ev tê wateya, ev hişmendî bû wêrekî û berxwedan, tirs şikand û bû îradeyek ji pola ku êdî nema serê xwe li ber zaliman bitewîne. Rêber Apo, vê serîhildan û berxwedana van hevalên xwe yên zîndanan, mîna peyamek fermanî pejirand û got “êdî ez ê di bin fermana van hevalan de weke neferekî çalak xebatê bidim birêvebirin” û wisa jî kir.

Li ser vî ruh, hiş, hest, helwest û xwestinên van hevalên serîhildêr û berxwedêr, hinek hevalên ji ber şûrê faşîzmê filitî bûn, li Rojhilata Navîn perwerde kir, vegerand welat û di encama van rêze xebatên hêja de pêngava 15’ê Tebaxê amade kir û di sala 1984’an de da destpêkirin.

Bi van rêze qonaxên şoreşgerî; ji biryara 1972’an derbasî berxwedana zîndana Amedê bû û bi Pêngava 15’ê Tebaxa 1984’an dewam kir hat Şoreşa Rojava û îro, di encamê de Kurdistana mirî rabû, zîndî bû!

Di nava çil salî de ruhê vê Pêngavê, ne bi tinê li çar parçeyên Kurdistanê belê bandora xwe li derveyî Kurdistanê jî kiriye. Çarçoveya destpêk û encamên cewherê vê Pêngavê, mirov dikare wisa destnîşan bike: Li ser hezkirina bi gel û welatê xwe re misogerbûna baweriya îradeya serbixwe, li pey şikestina tirsê li şûna wê avakirina wêrekiyê, armanckirina bihevrejiyana azad û demokrat bi hemû pêkhateyên Kurdistanê re, li ser vê bingehê avakirina peywendiyên enternasyonalî bi gelên herêmê û cîhanê re. Ji ber ku stûnên bingeha vê bîrdoziyê û Pêngavê ewqas bi hêz hatine danîn, li gel ku Rêberê wê 26 sal e di zîndanê de ye, dîsa jî ruhê vê Pêngavê bêrawestan meşiya.

Erê neyarên derve û yên hundur ên vê Pêngavê gelek bûn û neyarê herî malxerab jî xiyanet bû, mixabin heman xeter her nuha jî dewam dike. Bêguman ev neyartiya ewqas mezin, ne ji xurtbûna wan tê, belê ji lawazketina wan tê ku ewqas hewcedarî van çend kesên Berzaniya bûne.

Dîsa, divê li ser ruhê Pêngava 15’ê Tebaxê, rêxistinkirin hîn xurtir bibe.



# Di salvegera 10’an ya plana bêbext de pêş dîtinek

Rojek serê sibê ku “leşkerên mirinê” berê xwe dan vê axa tijî nalîn, mirin bû deriyê tekane. Ji ser 3’yê Tebaxa 2014’an 10 sal derbasbû jî, ji êşa xwe tiştek winda nekir. Belê “Dem dermanê her tiştî ye” pir gotineke klasîk be jî rastiyeke din li kêleka vê gotinê ye ku êş li ser kîjan rih û mêjî bi çi mezinahî, ango giranî rûniştiye divê em zanibin.

**Dizgûnê Dewrêş**



Şengal, bi 1000’an zarok ji wan hestên derûnî hê pêsîra xwe rizgar nekirine; dibe ku beşek ji wan, heya dawiya temenê xwe jî jê rizgar nebin. Yanê ev êşa giran, heya mirinê mixabin ji wan dûr nekeve jî. Beşek ji van bi şewazek din bikar bîne û ser vê êşê bigire, ji bîr kirinê bikar bîne; lê ev tenê ji derve wûsa xuya be. Beşek jî her temen mezin bû bi êş û tamên din van bîranînan re siviktir bike û jiyanê bi vî awayî bipejirîne. Eger bîne bîra xwe dehsal berê van rojan dinyayek wiha hebû: Bi 10 Hezaran kesên kinc reş, di destê wan de çek û derfetên artêşên fermî û li vê herêmê talan û mirin ji xwe re kiribûn al, kevana zêrîn dabûn ber “şûr”ên xwe yên jengarî (zinger bûyî). Li hêla din dinyayeke kezeb şewitî(!) li çokê xwe dida digot: “Hey wax ! Ev barbarî li vê herêmê serê herkesî bitewîne û biküje”

Bi 10 hezaran Kurdên Êzîdî ji van hovan re hiştin ku bi gorên komî werin “xelat” kirin! Plansazên wan rojan, herhal di nava xwe de van komkujiyana bi vî awayî nav dikirin. Kî dizane dakû li mal şaş nekin peyv û têgehên nixûmandî bikar dianîn; da ku zarok û endamên din yên malbatê ji van dek û dolabên bêbext agahdar nebin. Pê nehsin ku dayik û bavên wan cêwiyên rûhistinê serdemê ne.

Beyî armanceke maddî tu şer rû nadin. Komkujiya ku ji wê rojê virve li dora me sistematîk tê bicîh kirin jî bêyî vî aliyê maddî nirxandin xapîn e. DAIŞ, tenê amûreke sereke ya vê armancê bû. Wê demê zêde, lê îro jî li gor pêwîstiyan tê bikaranîn. Ya gûheriye tenê rêbaz û hincetên din niha li meydanê tên rêz kirin yanê cûreyî hecetan zêde bûne. Di armancê de tu guhertin tune ye. Plana 9’ê Cotmehê, navnîşana teqînên Siba, Şêx Xidir û Til Îzerê ne jî. Ji ber ku, encamên herduyan jî mirinên komî ne. 3’ê Tebaxê tenê ji bo temam kirina vê erkê ye. Di salvegera 10’mîn ya 3’ê Tebaxê de çav, guh û rihê me pêşketin û planên Rojava serdestan pir baş analîz neke û li gorî wê tevnegere nabe. Di her zemînê de ji her kesî re bête nîşandan ku ez bi mirini li pêy daxwazê xwe me. Eger ev bi vî awayî nebe, ji te bistînin. Siyasetê de beşa laweyan tune, guftûgo hene lê, bazar û dîplomasî bi vê beşê destpê nayê kirin. Ev rêbaz hem rêbaza herî nezanî, hem rêbaza here xisardar û hem jî rêbaza here lahnetî ya winda kirinê ye. Bazara rast pêşî garantî kirine beşa here mezin ya xwestekên tên kirin in ku li ser vana bazar nayê kirin. Guftugo, tenê vê teqezîyê fermî dike. Beşa 2’yem de de çi taktîkî û çi jî wekî berdêla vê statuyê tê girtin an jî tê berdan tê guftugo kirin. Şengal, piştî vê karesata plan kirî, êdî îspat û delîl a herî xurt ya destê me ye ku li ser bazar nayê kirin e. Eger aliyên peywendîdar mijara Şengalê, ji mijara stratejîk ya dahatuyê wekî

- Av
- Neft û gaz
- Cewher û mineralên stratejîk
- Rê û ragihandin
- Çandinî
- Guhertina demografîyê

Nêrînên ji van xalan dûr, wê bibe xeletiyeke pir mezin. Şerê ku qet li vê herêmê ne sekinîye, me wekî zindiyekî birîndar tenê bi xwe re mijûl dike ku em berê xwe nedin ser mijar, merhalê û rêyek cûda din da bi hêz nebe.

ŞOPA TILIYÊN KOMKUJIYÊ:

Encama qirkirina 3’ê Tebaxa 2014’an pêşiya hertiştî şopa tiliya hêzên zilhêz yên cîhanî û hêzên herêmî di serê civaka me de bi asteke bilind zelal bû.Hewildanên “şîlo” kirinê ya vê bêbextiyê digel hemû derfetên medyatîk û dorpêça birdozî jî biser neket. Gelê me, berpirsiyaran jî nas dike û berpirsiyariyên xwe çine jî her roj zêdetir dihese. Siyasetên ku li herêmê armanc dikirin ku Êzîdiyan bi teviz nadinê ji hole rakin bi vê bêbextiya sosyo-anestezik, şiyarbûneke tund re rû bi rû ma. Di dawî de kampên ku ew lê dihatin girtin niha derî tên dadan û ew vedigerin ser axa xwe. Yên koçberê welatên din bûyî xisarek bê sînor bihêle jî vegerek, nûve êşê hindik be jî, sivik dike. Gelê me, ji vê komkujiyê encamek mayînde derxistine, yan dernexistinê bi pratîka xwe ya nû nîşan bide. Îsbata vê ne mayîna li Şengalê ye tenê; di heman demê de dahatuyeke çawa re xwe amade dike ev jî girîng e. Ji bo vê, rê û organize bûneke xurt bo meşandina siyasî; rê û organize bûneke pêşketî bo aboriyekê ku li wir, di Şengalê de diafirîne, hildibirîne de bi hers û biryar be. Ev hem dibe sedema kar û debara ku asta jiyanê bilindtir bike û hem jî rêya hişbirina tevizandinê siyaseta “birinc-ard-rûn- şekir” re derî bigir e.

Di bin vê atmosferê de gelek tiştên hêja qewimîn û van kiryarên xêrab civaka me ya Êzîdî hejand. Hejandina komkujiyên berê piranî du encam derkevin pêşîyame, ew jî xurt kirina xwe parastinê û hewldana peydakirina derdorên bêalî yan jî muttefîqên nû. Lê vê care herî kêm çar encam derxistin hole. Li gel van herdû encamên ku ji bav û kalan mayî; fêm kirina girîngiya stratejiyek mayînê li jiyanê û tevgerîna stratejik.

Mirov, berhemdariya mêjiyî ya piştî vê komkujiyê, di vê çarçovê de bibîne. Eşkereye ku komkujiya 3’ê Tebaxê re gelê me yê veceniqî demek pişt re xwe ji vê şokê derxistiye û şiyar mayîn ji xwe re kiriye encamek xurt. Encamên vê şiyarmayînêye ku li ser hemû sazîyên civakî bîrmendî û afrînerî zêde dibe. Ji nifşên serdema komkujiyê ku zarok û ciwan bûn her roj hunermend, helbestvan, werzişvan, nivîskar û hwd radibin. Eva danasînekê pir erenî ye. Civakek wekî civaka Êzîdî ku hiyerarşiya civakî hê xurt e dikarî bû, zêdetir û leztir vêna pêk bîne. Lê ji ber pirsgirekên nava vê hiyerarşiyê nehatiye çareser kirin, loma jî sînerjiya ku tê hêvî kirin dernakeve holê.

Taybetî serdanên Qûbeyan û vegorîna Pêriyan de li dîwana dengbêjan, ji helbest û wêje yê re jî cîhek bê dayîn eve dilxwezi (motîvasyon) yeke zêde re rê vebike. Rêveberiya Xweser û dezgeyên civakî, qadên xwe zêdetir ji ciwanên afrîner re vekin.

Tişta ku bazarê dike bazar hilbirîn û pêdivî ne; lê tişta ku hibirînê geş dike jî bazara peyde kirina wan e. Serdîwanên van rûniştinan zêdetir ji vî nifşî re rê vebikin, berhemdarên vî nifşî jî zêdetir derkevin ser zemînên wiha li ber çavên raya giştî û xwe nîşan bidin. Sazî û dezgeyên Çand û Hunerê çiqasî hişmendiya li pişt berxwedanê xurttir bixwaze dive vê deriyê hûnerê xwedî bike, geş bike û rol bidê. Serkeftinên civakî, ger bi berhemdariya mêjiyê hate pesend kirin civak, ber bi pêşketin û rindî ve diçe. Fermana 3’ê Tebaxê bi vê derfetê ku hate têk birin hesabên tarî wê bixitimin. Ev derfet ji heye.

FENER



## Pêwîste Rejîma Sûriyê Ji Yek Heya Deh Bijmêre!

**Idrîs Henan**

Dem wisa lê hatiye ku her hêzek hewl dide di tewazina nû de cihê xwe saxlem bike û tevlîheviya heyî biçewisîne ku di nexşeya pêşerojê de xwedî statuyeke bi bandor be. Ji bona hêzên desthilat ancax ev yek bi rêbazên şidetê yên êriş, destwerdan û dijminahiyê pêkan be. Taybetmendiya têkiliyên bi pêxîrtengiya Rojhilata Navîn re derketiye holê, şiklê pêşeroja tê payîn jî tayîn dike. Ew jî diyar dike ka heya kîjan radeyê rejîmên netewe dewlet aloziyên kûr dijîn ku hewl didin bi rêbazên klasîk navendîbûna xwe biparêzin. Wê yekê jî bi dijberiya ji nirx û normên mirovatiyê re dikin û misogeriya hebûna xwe di tunekirina esaletê de dibînin! Rejîmên welê çendîn bi rikberiya civakî re rû bi rû bimînin, hewceya xweguhertinê nabînin. Berevajî, di ya xwe ya miletperestî, antî-demokrasî û yektîpê de bi israr dibin.

Ger mirov li nêzîkatî û kirinên rejîma Sûriyê, di dirêjahiya aloziya li welêt de binêre, dê bibîne ku bi qasî dijberiya ji daxwazên demokrasî, dadmendî û wekheviyê re kiriye, ewqas hovîtiya xwe weke kevneşopiyeke desthilatdariyê mîna terzekî nûjenkirina serdestî û hegemoniyê parastiye. Tevî hemû mudaxeleyên derdora netewe dewlet û dagirkirina axa Sûriyê, lê dîsa jî hebûna desthilatdariya xwe bi sîstemên weke xwe re dibîne û qet girîng nabîne ku bi hêza dînamîk a gelên Sûriyê re li hev bike û welat veguherîne sîstemeke demokratîk ku têra her kesî ye. Ev yek xwe dispêre zihniyeta di encama pêxîrtengiyan de hatiye afirandin ku li ser bingeha hewldana domdar a nûjenkirina amûrên hilberînê û şîdeta çavkaniya wê desthilatdarî ye têye avakirin.

Rejîmên di encama destwerdana li ser vîna gelan de çêbûne, çendîn hêza wan lawaz bibe û çiqas hatibin keviya hilweşînê, dîsa jî ne amade ne sûdê ji atmosfera demokratîk bigirin û li rex daxwazên rewa yên civakê rawestin. Bi qastî berevajî wê yekê dikin. Ew baş dizanin ka xwedî kîjan danheva avabûna çelûxwar in û li ser kîjan serguya sermeyadariyê hatine avakirin. Lewre jî; rejîmek fena ya Sûriyê ku ewqas sal in şerê îradeya çandên Sûriyê dike, pir bi hêsanî û bê dudulî, dikare bi dagirkerên axa Sûriyê re li dijî vîna pêkhateyên Sûriyê li hev bike û di nava planên qirêj de cih bigire.

Qet nêzîkatiyek xwe ya stratejîk di derbarê pêşeroja itîfaqa gelan de nîne. Çendîn şiklê lihevhatinê asê be jî, lê dema ku mijar dibe vîna gelên Sûriyê ya demokratîk, awantaja lihevkirinên taktîk li ser pişta çarenûs û axa vî welatî derdikevin pêş. Ji ber vê jî îro em dibînin ku li hemberî komkujiya rejîma Sûriyê ya li Dêra Zorê, bersiva dagirkeriya Tirk û çeteyên wê li tevayî xeta sînor ê bakurê Sûriyê heye. Ev ne lihevhatinek ji rêzê ya xwezayî ye. Konsept û planeke fîtnê ye ku armanca wê têkbirina îradeya azad û demokratîk a gelên Sûriyê ye.

Ji xwe konsepta rejîma Sûriyê û faşîzma Tirk ku bi kordîneya bi Îran û Rûsyayê re pêk tê, yek ji rêzeceribandinên vê bloka dijberî demokratîkirina Sûriyê ye. Bê guman ne ya dawî ye jî. Lê geşedanên bilez ên li herêm û Sûriyê tekez dikin ku ti luksa hêza parêzvanê demokrasiyê nîne bersivên biçûk bide. Wê şiklê bersiva were dayîn jî li gorî armancên konseptê muhteşem be. Ev yek wê bihêle rejîma Sûriyê û hevalbendên wê ji nû ve li hesabên xwe vegerin û çend caran ji yek heya deh bijmêrin. Hêvî jî ew e ku dema jimartinê derbas nebe û zû li xwe vegere ku ancax bi otorîteya demokratîk re jiyan ji bo wê pêkan be.